Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1189 24-Tîrmeh-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Pira Gindêhere (Cendere)



Li Kurdistanê hejmarek pireyan hene ku ji layanê hendesî ve wek yêkin. Hema hema kopiyên yêkin ji layanê bikaranîna amîran ve bigre heta dirêjahî û panetîya wan wek hevin. Gelek gotûbêj li ser van pireyan hene. Taybet çîrokên mîtolojîk, dişibin hev û din. Dema kurd qala çîrokên xwe dikin, bes keçên xwe dikin qûrbanê wan pireyane. Lê dema bi şêwazeke zanistî em ser disekinîn: Desthilatdaran ji bo keçên xwe ango xatûnên xwe, ev pireyene avakirine ango bi meremên leşkerî durist kirine lê navê keç ango jinên xwe li van Pireyan kirine.

Pireya Gindere: Li Bakurê Kurdistan Navçeya Kolik (Kehta) ya Semsurê ye. Yêk ji pireyên herî kevin yên cîhanê ye ku îro jî tê bikar anîn. Mîrateke mezin ya dîrokîye ku li Bakurê Kurdistanê hatiye avakirin. Navê wê Pireya Kurdî Gendêrê ye. Navê xwe ji Çemê "Gendê" digre. Rê wek derbaze Pire bikar anîne û bûye Gendêrê. Lê Tirkan guhêrîne û navê Cendere lê kirine. Cendere jî pênaseyekî gelek bê wete ye. Çemê Gindê yanî Çemê di nav Gindan de derbaz dibe. Nav çîyayên biçûk (tepe) de derbaz dibe.

Yanî Bi Weteya "Gindê Rê": Bi zimanê kurdi dema li ser çemekê re pîyade derbaz dibin dibêjin: "Li ser Gendêr here…" Di heman deme de hatiye kin kirin ku koka Gindêrê ji çûnê, derbaz bûnê hatiye yanî "Here" dest nişan dike.

Ev Pire di cîhek stratejîk ya bazirganiyê de hatiye avakirin ku bajarê antîk Perî jî, li heman deverê ye. Ev Dever herêma Desthilata Melikatiya Komageneya Kurdî bûye. Pir, di serdema Roma de hatiye avakirin. Lê ji ber ku rêyek bazirgani bûye dîroka xwe digehîne serdema Hîtîtan. Serdema İmparatorîya Roma de ev pir hate nûjen kirin. (193-211) Paşê navê wê kirin Pira Septîmîus Severos.

Ev Pire:

– Li Ser 2 kemberan hatiye avakirin.

-7 Metre Ferehe

-30 Metre Bilinde

– 120 m Dirêje

– Duyem pira mezine ku di Serdema Roma de hatiye avakirin.

– Pire bi kevirên birî ve û bê xerç hatiye avakirin.

Taybetmenditya Pira Ginderê, xerç bikar ne anine û bi şêwazeke sade avakirine. Di herdu serên Pireyê bi hev re hatiye girêdan û nîveka wê wek kendalekê bestane ye. Pire wisa avakirine ku li hemberî bûyerên xwezayî, keresat, erdhejan xwe rabigre. Pira Dîrokî, 55 km ji navenda bajarê Semsurê dûre. 2 Qezayên Bajarên Semsûrê Kolik û Sincik ê bi hev ve girê dide.

Ev Pireye hem ji aliyê hendesê, amirên bikar anîne û şekil û şemala ve wek ya Pira Delal ya Zaxo ye. Dema mirov van herdu pireyan rû bi rû dike. Dibîne ku ya heman serdemê ye û weke ku heman hostay dursit kiriye, hizir dike. Hem cografya Devera Zaxo hem jî coxrafya devera Semsûrê gelek dişibe hev û din. Çemê Ginderê jî hem mezinahî hem jî hecma wî dişibe çemê Xabûrê.

Pira Ginderê: 120m dirêje Pira Delal 115m bilinde

Pira Ginderê: 7m Metre Ferehe Pira Delal 5 m bilinde

Pira Ginderê: 30 Metre bilinde Pira Delal 16m bilinde

Di navbera Pira Ginderê û Pira delal de bes 2 cêwazi hene. Ew jî Pira Delal çavkaniyek zanistî li ser avakirina wê re heşta ser ne hatiye peyda kirin. Bes got gotên devkîne ku wek ku dema Ebasiyan de hatiye çêkirin. Lê ev ne raste. Ji ber ku hendeseya wê şêwazê Kurdî-Romaî ye. Lê Cewaziya li ser Pireya Ginderê ewe ku bi latini kîtabek li ser Pirê hatiye nivîsin ku piştrastiya Serdema İmparatora Romayê ye. Her wiha bi zimanê latîni ser keviran hatiye destnişan kirin ku İmparator a Romayê Septimius Severus vî pirê (193-211) jiber xatira Kurên xwe û Jina xwe avakirîye. Li Ser Derbazeyên Pireyê 4 Stunên bilind aliyê Sincikê hatine saz kirin ku wek xelat dîyarî Kurên Xwe, Stunên layanê Kolikê jî ber xatira Hevjîna xwe avakirine. Di nav demê de 2 stûn hatine xera kirin û îro bes 2 stunên kû dîyarê Hevjîna xwe kirîye mane.

Pira Ginderê piştî İmparator Septimus Severus dimire desthilatdariyê radestî her du Kurên xwe Carasalla û Geta yî dike. Geta Birayê xwe Carasalla ber çavê dayika xwe sere wî jêdike û desthilatdariyê dixe destê xwe û dibe Serokê İmparatoriya Roma yê. Dema layangirên Birayê wî cilên reş li xwe kirin Geta bêzar dibe û tevkujîyek mezin encam dide. Ev têzanîn di pertukên zanistî de jî hatiye piştrast kirin.

Ev devera Em qala wê dikîn Herêma Melikatiya Kurdî ya Komagene ye ku 5 bajarên mezin di bin kontrola wen de bûye.

Heta îro jî ev Pira Ginderê wek xwe maye û hatiye parastin. Hatin û çûn jî heta sala 2002ê edî Hikûmeta Tirkiyê biryar stend ku ji bilî giraniya 5 tenan, tirimbêl ser re derbaz nebin û di 500m nêz Pira Ginderê pireyek nû avakirine.

# Jin çima ji mêran bêhtir emr dikin?

Navenda Nûçeyan

**Li gorî lêkolîneke zanyaran, cudahiya bendewariya ji jiyanê ya navbera jin û mêran, dibe ku ji ber hucreyên germ be ku sperm û bizir hildiberînin.**



Li gorî Enstîtuya Lêkolînên Demografîk ên Neteweyî ya Fransayê (INED), di sala 2020'î de li Fransayê emrê jiyanê yê dihate payin ji bo mêran 79.2 sal, ji bo jinan jî 85.3 sal bû. Zanyaran hewl dan vê cudahiyê fêhm bikin û keşfên nû kirin.

Lêkolîneke nû ya ku li kovara Science Advances hate weşandin, dibe ku ev sir kifş kiribe. Lêkolîneran di dema lêkolînê de li ser masiyê lûle yê bi rengê turkuaz killies hin ceribandin kirin.

Nivîskarê sereke yê lêkolînê Tohru Ishitani ji The Guardian re axivî û got, "Pêvajoya extiyarbûnê ya masiyê Killies dişibe ya mirovan. Ji be vê jî bi dîtina min rewşa mirovan zêdetir tevlîhev nîne. Ev lêkolîn ji bo kontrolkirina extiyarbûyînê ya mirovan dikare bibe gaveke girîng."

Lêkolîneran giranî dan ser lêkolînkirina hucreyên bizir û spermê ku di navbera herdû zayendan de cudahiya herî mezin e. Di ceribandinên li ser killies de hilberîna hucreyên germ rawestandin ku ji bo mêran spermatozoa û ji bo jinan jî bizir hildiberînin.

Weke encam jî lêkolîneran tespîtkirin ku bêyî hilberîna hucreyên zayendî mêr hîn bêhtir dijîn û jin jî hîn ciwan dimirin. Yanî tespîtkirin ku herdû zayen xwedî heman bendewariya jiyanê ne.

Tohru Ishitani got, "Em li bendê bûn ku dema hucreyên zayendî ji holê rakin hem mêr hem jî jin, temenê wan zêde bibe. Lê belê me dît ku ev yek tenê emrê mêran dirêj dike, emrê jinan jî kurt dike. Ev rewş nedihate texmînkirin, lê belê me dît ku ev keşif cudahiya navbera bendawariya jiyanê ya zayendan dikare hîn baş bê fêhmkirin."

## Bi kamîreya Birûc Resûl



## FERHENGA BIWÊJAN

**Rûyê wî ji ti kesî naêşe:**
- Ji ti kesî şerm nake; rûşûştî ye; rûyê wî qayîm e.

**Rûyê xwe bi mîza xwe şûştiye:**
- Ji binî şerm nake; pir bêedeb e.

**Rûyê xwe daye bin piyê xwe:**
- Bi heman wateyê.

**Rûyê xwe reş kir, pariyê xwe xweş kir:**
- Rûyî wî qayîm e; şerm nake.

**Sed tir û tirek li cem tirekan yek in/tirek û du tir li cem tirekan yek in:**
- Perdeya rûyê wî qetiyaye; mirovekî bêfihêt e.

**Tif kirine beqê, gotiye; rûyê min bi ava behrê şil nabe, vêca wê bi tifa we şil bibe:**
- Mirovekî pir bêşerm e.

**Tir ji Qeyso re kir eyb:**
- Jixwe her tim wî karî dike, ev ne cara yekê ye.

**Xwe berda der:**
- Xwe tazî kir; bêşermî kir.

**Xwezî min cotek sol ji rûyê te hebûya:**
- Rûyê te pir qayîm e.

**LI SER NEGIRÎNGIYÊ**

**Bê malê, malxwê malê, neyê malê qeda salê:**
- Dema tiştek, yan kesek winda dibe, lê pir girîng neyê dîtin, hingê tê gotin.

**Bi avê de berde:**
- Xeman nexwe; serê xwe pê neêşîne; ne girîng e.

**Bi tir xwe de çû/di tir xwe de çû:**
- Ji kîsî xwe çû; çûna wî ji ti kesî re ne xem e, çawa yek tirekê bike.

**Ew mirî nakeve ber wî girî:**
- Nahêje ku bê kirin; li ber nakeve.

**Hat, malxwê malê, nehat, ziyana salê:**
- Dema tiştek, yan kesek winda dibe, lê pir girîng nayê dîtin, hingê tê gotin.

**Ji ber çavê xwe avêt:**
-Êdî girîngî nedayê; dev jê berda; têkiliya xwe jê birî.

**Ji çavê xwe deranî:**
- Bi heman wateyê.

**Ji kîs xwe çû:**
- Xwe avêt agir û ti kes nîne lê xwedî jî derkeve.

**Ji singa xwe avêt:**
- Êdî girîngî nedayê; ji çavê xwe derxist.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Jinên Ciwan: Ji bo Azadiya Rêber Apo em ê asta berxwedanê bilind bikin

Jinên Ciwan yên Rojavayê Kurdistanê diyar kirin ku ew ê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo berxwedanê li tevahî cîhanê berfireh û bilind bikin.**R-2**



## Peymana Lozanê plana qirkirina gelê kurd e

Gelê kurd hîna daxwaza bidestxistina mafên xwe yê rewa û Kurdistana yekbûyî dike. Piştî ku ew xewn li ser îmzekirina peymana Lozanê ji holê hat rakirin û gelê kurd di bin hegemoniya Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûriyê de hate hiştin. Gelo naveroka vê peymanê çi ye û Tirkiyê niha çi plan dike?**R-4**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1189 24-Tîrmeh-2024 www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S

# KONGREYA NIŞTIMANÎ BINGEHA ÇARESERIYA AlOZIYA SÛRIYÊ YE

Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê ji destpêka avabûna xwe ve û heta niha ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê gelek xebat dane meşandin. MSD'ê herdem daxwaz û armancên rewa yên gelên Sûriyê, hevgirtina pêkhateyan, yekkirina nêrînên Sûriyan û çareseriya siyasî ji kirîza Sûriyê re wekî pusuleya têkoşîn û xebatên xwe nîşan daye. Di heman çarçoveyê de herî dawî MSD'ê bang li tevahî sûriyeyan, bi taybetî hêzên wê yên siyasî kir ku ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê kongreyeke niştimanî li dar bixin.**R-3**



## 'Lihevkirina Erdogan û Esed li dijî berjewendiyên gelên Sûriyê ye'

Piştî 13 salan ji talankirin û qirkirina gelan; Erdogan û Esed careke din ber bi lihevkirinekê ve diçin. Hevserokê Partiya Sûriye Pêşeroj li kantona Efrîn û Şehbayê Mihemed Bêrem destnîşan kir ku hevdîtinên di navbera Erdogan û Esed de eger bên kirin, wê li dijî berjewndiyên gelên Sûriyê be.**R-5**




## Nexweşxaneya Onkolojî, Talasîmya, Penceşêr û Şewatê



Rêveberiya Nexweşxaneya Heyva Sor a Kurd Hediya Abdullah diyar kir ku pêwîst e hemû rêxistinên navcîhanî û mirovî yên têkildar û kesayetên tenduristî û civakî ku hemû pêdiviyên pêwîst ji amûrên bijîşkî û derman ji nexweşxaneyê re peyda bikin.**R-6**

## Ji çiraxên wêjeya kurdî



Helbestvanê şehîd Rizgar yek ji wan xwendekarên yekemîn bû ku parastina doza welat û gelê xwe kir û canê xwe ji bo rizgariya wê feda kir.**R-7**

Nehîr pale — Tevgera Talîban qatilê jinên azadîxwaz e R-2
Farûk Sakik — Hedefên Dagirkeriyê R-5
Zekî Bedran — Ronakkirina gel neçariyek e R-5
Rohat Bulut — Di civakê de temsiliyeta jinê R-6
Kemal Necim — Pêşangeha Pirtûkan piştî 7 salan.. hin têbînî R-7

# Jinên Ciwan: Ji bo Azadiya Rêber Apo em ê asta berxwedanê bilind bikin

Jinên Ciwan yên Rojavayê Kurdistanê diyar kirin ku ew ê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo berxwedanê li tevahî cîhanê berfireh û bilind bikin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di 10'ê Cotmehê de li 74 navendên Ewropayê û welatên cîhanê, bi pêşengiya nivîskar, hunermend, kesayetên navdar, siyasetmedar û saziyên azadîxwaz ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan û çareseriya pirsgirêka Kurd pêngaveke nû ya azadiyê hat destpêkirin. Ev pêngav ji hemû aliyên azadîxwaz ve bi dilgermî hat pêşwazîkirin û pêl bi pêl li hemû cîhanê belav dibe.

Komploya li dijî Rêber Apo û dîlgirtina wî ne tenê li ser şexsê wî bû. Di şexsê Rêber Apo de hêzên desthilatdar xwestin îrade û fikrên azad ên hemû gelên bindest, jin û ciwanên azadîxwaz, çand û baweriyan tune bikin û di bin tecrîd û îşkenceyeke giran de hebûna wan tune bikin. Rêber Apo jî bi hêza xwe ya heqîqetê, têkoşîna xwe ya azadiyê heya roja îro wekî Rêberê Gelan tê qebûlkirin.

Di çarçoveya pêngava azadiya Rêber Apo ya ku bi duruşmeya 'Ji Rêber Abdullah Ocalan re Azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareserî' heya roja îro didome. Jinên ciwam yên Rojavayê Kurdistanê ji Rojnameya me re axivîn.

Rêveberiya Jinên Ciwan a Desteya Civakî ya Ermenan Losnak Kavoriyan diyar kir ku ew dikarin pêngava azadiya fîzîkî ya Feylesûf Apo mezin bikin û azadiya wî misoger bikin wiha got: "Di dîroka mirovahiyê de jin rastî gelek serdeman hat ku ji bona wê mirin îfade dikir. Zihniyeta zilamê serdest ku bandoriyek gelek mezin li ser şexsê Jin dabû avakirin, me bi serê çavê xwe dît ku bi hatina dewleta islamî ango bi ser navekê din DAIŞ`ê careke din Jin hate kolekirin û di tarîtiyê de ma. Ne tenê Jina Kurd rastî van kiryarên dijmirovî hatin, bêguman hemû Jin û pêkhate rastî van kiryarên qirêj hatin. Heya mirov dikare nimûna vê di dîroka serdestiyê de bibîne, demeke wiha bû ku Zikê Jin û dayikan diqelişandin da ku bizanibin hebûna ku di zikê wê de jiyan dike çi nesle. Her wiha Jina suriyanî, Jina ermenî û Jina ereb rastî nêzîkatiyên bi vî rengî hatin. Lê bi avabûna şoreşa 19'ê Tîrmehê Jin careke din bû xwedî sernaveke cuda, jina ku dihate kolekirin îro di qadên jiyanê de xwe isbat dike. Her wiha li dijî hêzên hegemonîk divê em destnîşan bikin ku hebûn û azadiya feylesûfê mezin Abdullah Ocalan bi azadî û hebûna ciwanan, jinan, gelan bûye yek. Îro li her derê bi sekneke çalak a li dijî êrişên hêzên serwer em dikarin pêngava azadiya fîzîkî ya Feylesûfê mezin Abdullah Ocalan mesoger bikin."

**'Deng Jinê wê bibe dengê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo'**

Losnak Kavoriyan di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Ev demeke dirêje ku dewleta tirk a dagirker bi ti awayî rê nade ku bi remanzanê mezin Abdullah Ocalan re hevdîtin çêbibe û her dem dixwazin fikirê wî dadwervîn in. Ev jî xeteriyekê dide avakirin, ji ber ku her roj rewş xirab dibe, her wiha li imraliyê feylesûf Abdullah Ocalan bi fikirê xwe li hemberî faşîzmê şer dike. Îdaya me jî ew e ku pêwîste Rêber Apo rizgar bibe û di nava me de jiyan bike. Ji xwe di gureva imralî de Rêber Apo 5 pirtûk yên girêdayî jiyana insanan nivîsand û rêbaza jiyanê da pêşiya me. Feylesûf Abdullah Ocalan got: "Pirtûkên min li kur bin ez li wirim". Em bi xwe jî li gorî vê perspektîfê dimeşin û hewl didin di asteke gelek mezin de fikirê wî belavî her derî bikin. Em ê bikaribin gelek gavan bavêjin û bibin xwedî baweriya ku feylesûf Abdullah Ocalan daye me û deng û rengê Jinê wê bibe dengê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo."



Losnak Kavoriyan



Xaliya Bekê

**'em ê asta berxwedanê û têkoşînê ji bo azadiyê bilind bikin'**

Di heman çarçoveyê de Berdevka Jinên Ciwan yê bajarê Kobanî Xaliya Bekê diyar kirin ku ew bi naskirina fikrên azad, gavên mezin avêtin û wiha got: "Em weke jinên ciwan dixwazin agahiyê ji Rêber Abdullah Ocalan bigrin. Ger Rêber Apo nebûya em dernediketin û nedigihîştin vê astê ku di hemû meclis û saziyan de em serbest baxivin û nêrînên xwe bînin ziman. Tiştê ku Rêber Apo ji me re kir ne kêm e, pêwîst e em jî azadiya wî ya fîzîkî mesoger bikin û hemû erkên li ser milên xwe pêk bînin. Em jî weke ciwan çi ji destên me were em ê ji bo Rêber Abdullah Ocaln bikin, çawa wî riya azadiya da me, em ê jî asta berxwedanê û têkoşînê ji bo azadiyê bilind bikin."

**'Pêşengtiya vê pêngavê gel û ciwan dikin'**

Xaliya Bekê di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku ciwanên Kurdistanê, ciwanên Tirkiyeyî, ciwanên Ereb, divê pêşengtiyê hem ji pêngava 'Azadiya ji bo Abdullah Ocalan, çareseriya siyasî ji bo pirsgirêka Kurd' bikin hem jî bigihîjin gerîla û wiha domand: "Gerîla têkoşîna xwe di xeta Bêrîtan û Kemalan de bi rê ve dibe. Bi vê têkoşîna mezin a li Kurdistanê, bandor bi tenê li ser gelên herêmê nabe. Em di vê kampanyayê de dibînin ku hêviya gelan ji gerîla heye. Pêşengtiya vê pêngavê gel û ciwan dikin. Gelê me û yên herêmê têkoşînê di xeta Rêber Apo de geş dikin. Rêber Apo ku tecrîdkirî ye bi sekna xwe bi awayekê bêhempa li ber xwe dide. Her wiha em wekî jinên ciwan yên Rojavayê Kurdistanê berxwedan û kîna me li hemberî dijmin zêdetir û mezin dibe. Bi salvegera şoreşa 19`ê Tîrmehê em Azadiya Rêber Apo pêk bînin."


# Xewna xwe ya projeya jîngehê kir rastî

**Navenda Nûçeyan**

Alya Bekir a ji Efrînê, xeyala xwe ku bibe endazyara avahîsaziya ekolojîk, kir rastî. Alya sembolên bajarê xwe di projeyeke jîngehî de rave dike.

Alya Bekir ji bajarê Efrînê ye ku ji sala 2018'an ve di bin dagirkeriya Tirk de ye. Piştî dagirkirina Efrînê, Alya tê Qamişloyê û xwendina xwe li Zanîngeha Rojava didomîne. Piştî keda 5 salan a li Fakulteya Endazyariya Mîmariya Jîngehî, xewna xwe ya zarokatiyê ku bibe endazyara avahîsaziya ekolojîk, bi cih anî.

Beriya çend rojan Alya Bekir tevî 8 hevalên xwe yên zanîngehê projeya derçûnê pêşkêş kirin. Alya 5 mehan bi projeya xwe ya derçûnê ve mijûl bûye. Projeya Alyayê ya derçûnê avakirina navenda lêkolînên çandiniyê ye. Alyayê li ser projeya xwe got: "Min xwest vê projeyê li bajarê xwe ava bikim, ji ber ku hewcedariya wê pê heye. Eger ev proje pêk bihata dê ya yekemîn bûya."



Li gorî projeyê, qada avahiyê navenda lêkolînên çandiniyê 6 hektar e. Di projeyê de beşek ji bo karkeran heye ku lêkolîner çavdêriya wan dikin, cotkar perwerdeyan li ser çandina daran dibînin. Alyayê destnîşan kir ku cotkarên li herêmê tu lêkolînên berfireh li ser nexweşiyên zeytûnan nedîtine.

Her wiha di projeyê de navenda lêkolînên çandiniyê heye ku pêşxistina çandiniya zeytûnan, başkirina kalîteya zeytê û perwerdekirina cotkaran li ser rêbazên herî baş ên çandiniyê armanc dike. Di heman demê de kargeha guvaştina zeytûnan, cihê dagirtina zeytê û kargeha çêkirina hebên vîtamîna zeyta zeytûnan hene.

Alya Bekir diyar kir ku lêkolîna wê di radeya yekemîn de li ser esasê sûdwergirtina ji zeyta zeytûnan di çêkirina sabûn û madeyên ciwankariyê de û ji madeya "bêrîn" ya ji dara zeytûnan tê derxistin ku ji zeyta wê zeyta şewitî tê çêkirin.

Di projeyê de kargeha ku bermahî û pelên zeytûnan dikin komir û semad û stasyoneke avê jî hene. Alyayê got: "Ji bo parastina jîngehê min herêmeke tampon ku ji dîwar, qadên heşîn û beşên avê yên dûrî qirêjî û qarbalexê çêkiriye. Min di avakirina avahiyê de jî madeyên jîngehparêz û enerjiya tavê bi kar anîne. Min li rûyê avahiyê hêşîn bi kar aniye da ku wê ji hewa û tîrêja rojê paqij bike."

Endazyarê mîmarî û hîndekarê li Fakulteya Endazyariya Jîngehê ya Zanîngeha Rojava Fadil Îbrahîm jî li ser projeya derçûnê ya Alya Bekir got: "Asta Alyayê bi dest xistiye, encama keda 5 salan a xwendin û perwerdeyê ye. Projeya wê dê di siberojê de xizmeta herêmê bike."

Fadil Îbrahîm derbarê projeyên xwendekaran de jî diyar kir ku projeya avakirinê di projeyên xwendekaran de ji sedî 40 derbas kiriye û got: "Ev tê wê wateyê ku ev proje guncaw in û dostên jîngehê ne. Em bi hêvî ne ku li ser erdê pêk werin."

## Ji Pênûsa Jin

### Tevgera Talîban qatilê jinên azadîxwaz e

Nehîr Pale

Jina Afxanî dawiya sedsala 19`emîn û destpêka sedsala 20`emîn li gorî şert û mercên Afxanistan derfet dît ku daxwaza mafên xwe bike. Di çarçoveya wê de sedsala 20`emîn li Afxanistanê dibistan ji bo şagirtên jin hatin vekirin. Piştî wê ji bo wekheviya di navbera jin û mêr de jina Afxanî dest bi têkoşînê kir. Yek ji rêbazên ku destpêkê dane bikar anîn kovara bi navê `Erşad-e Niswan` a jin vekirin. Bi riya kovarê daxwaza wekheviya di navbera jin û mêr de anîn ziman. Sala 1977`an Rêxistina Şoreşger a Jinên Afxanistanê ji aliyê Mîna Kîşwar Kemal ve hat ava kirin. Mîna Kîşwar çalakvaneke siyasî bû û li dijî zayendperestiyê dest bi têkoşînê kir. Mîna ji ber xebatên xwe yên siyasî û rêxistinkirina jin sala 1978`an ji aliyê dagirkeran ve hat kuştin.

Iqtîdara Afxanistanê gelek caran hatiye guhertin. Jin herî zêde di wextê ku iqtîdar ketiye destê Talîban de rastî rêbazên tûndiyê yên dijwar hatiye. Tevgera Talîban sala 1994`an hatiye ava kirin û sala 1996`an iqtîdar ketiye destê wan de. Hukmê wan li Afxanistanê ji sala 1996-2001`an berdewam kiriye û sala 2021`an dîse Afxanistan dagir kirin.

27 sal li ser avakirina tevgera Talîban derbas bûye û di wextê iqtîdar ketiye destê wan de bi temamî hebûna jin tê inkar kirin. Sala 1996-2001`an tevgera Talîban her tişt li ser jina Afxanî qedexe kiribû. Kîjan jin li hemberî vê yekê derketibane dihat recim kirin û rehmet lê nedikirin. Hemû dibistanên ji bo şagirtên jin hatibûn vekirin, girtin û qedexe kirin ku jin bixwîne û bixebite. Divê jin ji malê dernekeve û eger derbikeve jî divê mêr pêre hebin.

Herî dawî zilamekî bi sîfeta oldar têkoşîna jinê û daxwaza wê ya azadiyê dixe rojeva civaka Afxanî. Hewl dide ku civaka Afxanî li hemberî jinê tehrîk bike, rêbazên xwe yên li hemberî jinê didin bikar anîn ku bi civaka Afxanî bidin qebûl kirin. Mêrê Oldar di xutbê de ji her kesî re dibêje kîjan jin daxwaza azadiyê bike divê wê tazî bikin û li kolanên bajarê Kabil ê Afxanistan bigerînin. Bang li hikûmeta Afxanistanê dike ku hemû jinên azadîxwaz tazî bikin û li kolanên Kabil bigerînin da ku herkes bibîne û careke dîtir kesek behsa azadiyê neke. Jinên têkoşîna azadiyê dikin wan weke fahîşe pênase dike û dijminê ola Islamê radgihîn in. Her wiha di nava gotinên xwe de tîne ziman ku di lêpirsînê de jin têne tazî kirin û vê yekê rewa dike.

Tevgera Talîban wê rêbazên ku berî zayînê li hemberî jin hatine bikar anîn, dîse bikar bînin. Berî zayînê mêrên oldar bi navê ol jin gunehkar radighandin, ew tazî dikirin û li kolanan digerandin. Jin tazî kirin û li kolanan gerandin rêbazekî cezakirinê yê di bin navê ol de tê kirin. Her wiha Talîban jî mîna Xiristiyanan wê jinên têkoşînvan û azadîxwaz gunehkar û dijminê ol îlan bikin û li dadgehên mîna dadgehên engîzasyonê bukjin. Niha dadgehên şoreşger ên Îranê heman tiştî dikin, kîjan jin siyasetê bike, têbikoşe û daxwaza azadiyê bike wê li girtîgehan dirizîn in. Ji bo jin koledariyê qebûl bike û serî hilnede, wê hemû rêbazên qirêj li ser wê bidin meşandin.



# Ji çiraxên wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvanê kurd ê şoreşger Zerdeşt Îsmaîl Heybet...

Helbestvanê şoreş û welat û sembola rewşenbîrê şoreşger.

Dema ku welat vediguhere dojehekê ku ji aliyê keriyên gur û keftaran ve were birêvebirin û qeyd û bendên serjêrkirin û koletiyê were ferz kirin û deriyên zindanên xwe vedike ji kesên ku serî hildide li dijî kerî û ezbenîtîyê û devê wan kesên ku dengê wan bilind dibe tenê ji ber dilsoziya bi rastiyê û li dijî her cure gendelî û stemkarîyê were girtin, wê demê gelê vî welatî ji bo bidestxistina azadî û parastina rûmeta xwe li dijî wê koma desthilatdar serî hildide û ji bo azadkirina wî welatî canê xwe feda dike.

Hezkirina welat wek sembol, şanazî û serbilindî tê dîtin, erkê hemû zarokên wê yên bi xîrete ku bi hemû hêza xwe berevanî û parastina wê bikin, û netewe jî xwedî maf e, çawa ku mafê dayîkê heye û divê her kes pabendê (pêgirê) wan be.

Helbestvanê şehîd Rizgar yek ji wan xwendekarên yekemîn bû ku parastina doza welat û gelê xwe kir û canê xwe ji bo rizgariya wê feda kir. Helbestvanê Kurd ê şehîd Zerdeşt Îsmaîl Heybet (Rizgar) di sala 1962'an de li bajarê Dêrikê ji dayîk û bavê xwe (Îsmaîl û Fatima) yên kurd hatiye dinê .Şehîd Rizgar di nava malbateke welatparêz a bi ruhê berxwedanê yê neteweyî de mezin bû, ji dilsoziya malbata xwe ya ji bo welat û hezkirina xaka xwe fêrî nirxê jiyanê bû û ew bi ruhê şoreşgerî û hezkirina azadiyê dilmişt bû û ji bilî dayînê tiştek din ne dizanîbû,wî hîn di temenê biçûk de berpirsyariya têkoşînê girt ser milê xwe, nemaze piştî ku pismamê wî Letîf Cezrê di sala 1980'an bi destê çeteyên dewleta Tirk şehîd ket. Meyla xwe ya wêjeyî û hezkirina xwe ya ji bo nivîsandina helbest, noşe, gotar û çîrokan bi zimanê kurdî ji zarokatiya xwe de, di dema dibistana navîn de di nîvê salên heftêyî de dest pê kiriye û bi zimanên kurdî û erebî baş dizanî bû. Ew dilxwaz û mereqdarê xwendina edebiyata kurdî û helbestvanên kurd ên wekî Cegerxwîn û Melayê Cezîrî bû, ewî ji zanist û çanda kurdî hez dikir û heta li çeperên şer ên çiyayên Kurdistanê, di destekî wî de çek û di destê din de jî pênûs û pirtûk hebûn, ewî helbest dinvîsandin û bîranînên xwe yên rojane bi rêhevalên xwe yên çekdar re û li ser xwezaya Kurdistanê û bedewiya wê ya balkêş dinivîsand.

Ji bo wî, helbest ne tenê peyvên hema derbasdibûn bi lez û bez ên ku di nav raya giştî de derdiketin, lê ew hestek kûr û germ bû ku û di dil û can de diherikî hiş bi bedewiyê tijî dikir û hestek bêdawî dida derdora xwe. Di sala 1968'an de qonaxa seretayî li dibistana Rifet Hac Sirî, ya navîn û amadeyî li dibistana Yûsif El-Ezeme ya bajarê Dêrikê xwend, di sala 1980'î de bawernameya bekeloriya wergirtiye, ew pir jêhatî bû di hemû qonaxên xwendina xwe de, paşê di sala 1981'an de ji bo qedandina xwendina xwe ya zanîngehê çû bajarê Humsê û li wir kulîjeya Endezyariyê beşa Endezyariya Mîmariyê xwend û di sala duyemîn de ji bo ku xwe nêzî welat û gelê xwe bike derbasî Helebê bû û di sala 1986'an de bi serkeftî qedand .

Li gel xwendina xwe, noşe û helbestên netewî û şoreşgerî li ser berxwedana lehengên Kurdistanê û şehîdên azadiyê nivîsandine û di nava refên xwendekarên zanîngehê û girseya gel de têkoşiyaye. Ji helbestên wî yên ku bandoreke kûr li ser gelê kurd kiriye ev in (Kanî Kurdistan, Şorşa Agir, Artêş fa ye Lo, Şerê gel hoye, Şêxê min rabe bese, Banga Şoreşa cîhan...)



Piştî qedandina xizmeta xwe ya mecbûrî di artêşa Sûriyê de, di sala 1988'an de tevlî Akademiya Mehsûm Korkmaz dibe,piştî bidawîkirina dewreya perwerdeya siyasî û ji ber zanîna wî ya bi çend zimanan (Kurdî, Erebî, Tirkî û Îngilîzî), şarezayî û çanda wî ya giştî û jêhatîbûna wî ya siyasî û dîplomatîk. Rêbertiyê ew hilbijart ku nûnertiya tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê li Ewropayê, bi taybetî li komarên Yekîtîya Sovyet û welatên Kafkasyayê bike, ji bo birêvebirina xebatên siyasî û neteweyî di nav girseyên kurdan de û xebatên çandî û rewşenbîrî di nav beşa rewşenbîrên kurd û biyanî de bike. Di sala 1993'an de careke din vedigere Rojava û di Mijdara 1993'an de li herêma Botanê derbasî qada şerê germ dibe û ji bo fermandariya herêma Gabarê û nûnertiya partiyê li herêma Kurdistanê tê hilbijartin ta ku digihêje asta şehadetê di roja 26/12/1998'an de bi çar rêhevalên xwe re li çiyayên Gabar-Girê sor - herêma Findikê bi guleyên balefirên cengê yên dagirkeriya Tirk.

Tu pir zû çûyî, te êşek di canê me de, kulek di dilê me de û hêsir di çavên me de hiştin.

Li pey xwe mîraseke wêjeyî û çandî ya dewlemend ji gelê Kurd re hiştiye.

Gelek gotarên wî yên wêjeyî (edebî)bi zimanê kurdî hene ku di kovara (Rewşen) de li Ewropayê hatine weşandin. Di van demên dawî de birayên wî (Laleş, Egîd, Kawa û Seîd) ji tirsa windabûn, jibîrkirin û zirarê karîbûn çend helbestên wî berhev bikin û bi navê Avdana Agir di dîwaneke helbestî ya bi zimanê Kurdî de çap bikin û biparêzin.

Ji ruhê wî yê pak re, rûmet û ebedî. Ji têkoşîn, mîrasa wî ya şoreşgerî û wêjeyî re mayînde û berdewamî.

# 'Dengbêjî dîrok e'

**Navenda Nûçeyan**

**Sebrî Sipêrtî yê ku dem bi dem di nava civatan de stranên dengbêjiyê dibêje, diyar kir ku pêwîste hunera dengbêjiyê di nava civaka Kurd de bê parastin û got: "Dema civatek kom dibe daxwaza dengbêjiyekê tê kirin, ez dibêjim. Dengbêjiyên di şahiyan de tên gotin bi komên mezin tên gotin, ez ji li gel wan dibêjim."**

Di gelek serdemên cuda yên dîrokî de li Kurdistanê dengbêjî rolê dîrokê leyîstiye. Gelê Kurd bi dengbêjiyê berxwedan, serhildan, mêrxwazî û çanda xwe gihandiye nifşê pêşiya xwe. Di roja îro de jî gelê Kurd bi çand û hunera xwe ya dewlemend ya dengbêjiyê di nava gelek civakên din de tê naskirin. Ji bo parastin û dewlemendkirina dengbêjiyên heyî, pêwîstî bi xwedîderketinek mezin heye. Têkildarî vê mijarê jî



Sebrî Sipêrtî yê ku dem bi dem dengbêjiyê di nava civatan de vedibêje, ji ajansa me re axivî.

**'Bi dengbêjiyan dihatin bibîranîn'**

Sebrî Sipêrtî di destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser girîngiya dengbêjiyê ji bo dîrok û parastina nirxên civakê û wiha got: "Di dîroka me Kurdan û ya giştî gelan de kesên dengbêj di şîn û şahiyan de dengbêjiyên xwe dihunandin. Ji ber ku tu amûrek yê mûzîkê tunebûn, tenê dengbêjî dihatin gotin. Piranî dengbêjên berê dengbêjî bi kesên mêrbaş, egîd, mêrxwaz, wêrek, serokeşîr û yên di şerên xwe de jêhatî bûn di gotin. Ji bo ku mêrbaşî û mêrxasiya wan kesan di dîrokê de winda nebe, bi dengbêjiyan dihatin bêmirinkirin. Li herêma me Botanê jî, ev çand gelek li pêş bû. Piranî dengbêjî bi kesên ku di şerê xwe de xurt bûn dihatin gotin. Lê di roja me ya îro de gelek egîd û mêrxasên welatê me hene ku dengbêjiyên me gelek kêm dengbêjiyê bi wan dibêjin. Pêwîste dengbêj û hunermendên me li ser lehengên me yên ji bo axa xwe canê xwe dayîn, dengbêjî çêbikin."

**'Min dengbêjî ji malbatê girtiye'**

Sebrî Sipêrtî di berdewama gotinên xwe de destnîşan kir ku ne mîna dengbêjekê, weke kesekî ji dengbêjiyê hezdike dengbêjiyan dibêje û wiha pêde çû: "Min bixwe dengbêjî ne gotine, lê min guhdarî kesên dengbêjiyê dibêjin kirine. Di nava malbata min bixwe de jî dengbêj hebûn, min li wan guhdar dikir û min hindek dengbêjî ji wan girtiye. Min cihê xwe di tu kom û karên hunerî de ne girtiye. Lê ger bê xwestin di nava civat û şehiyên bûk û zava de ez dengbêjiyan dibêjim. Piranî em di şahiyên zewacê de dengbêjiyên lawik yanî dengbêjiyên 'Evîndarî' dibêjin. Min weke kes xem ji dengbêjiya xwe nexwariye. Ji bo wê jî piranî ji bîra min çûne. Gelek kes xem jê dixwin dengbêjiyên heyî dinivîsin û di parêzin. Dema civatek kom dibe daxwaza dengbêjiyekê tê kirin, ez dibêjim. Dengbêjiyên di şahiyan de tên gotin bi komên mezin tên gotin, ez jî li gel wan dibêjim."

Sebrî Sipêrtî gotinên xwe wiha bi dawî kir: "Dengbêjiyên tên gotin li gorî civatan û cihên ku em lê rûdinin tê guhertin. Daxwaz û hêviyên me ji gelê me ew ku dengbêjî û çanda xwe winda nekin. Ji ber ku dengbêjî dîroke, pêwîste were parastin. Kesên dengbêjî dibêjin ne ji bo navê xwe, ji bo parastin çand û dîroka gelê xwe dibêjin."

## Têbînî



### Pêşangeha Pirtûkan piştî 7 salan.. hin têbînî

Kemal Necim

Pêşangehên pirtûkan mîna ansîklopediyeke mezin in, tê de naveroka ramanên nivîskar, bîrmend û afrîneran heye. Ji ber ku pirtûk serpêhatî û ramanên kesên din in ku civak dikare sûdê ji wan bigire, Pêşangehên pirtûkan li her welatê cîhanê wekî çalakiyeke bi nirx têne lidarxistin, ku di qadeke diyar de komek pirtûk û herhemên nivîsandî û danerên wan têne ba hev ku xwendevan dikare bi hêsanî wan bibîne da ku çi jê re bikêr e û çi li gorî pêdiviyên wî yên xwendinê ne hilbijêrin,

Pêşangehên pirtûkan ne tenê cihekî ji bo pêşadndan û firotina pirtûkan e, ango ne tenê bazreke firotinê ye. Pêşangehên pirtûkan dikare bibe helkefteke ji bo çasipandina rol û bandora çandê, çi bi rêya weşanê û çi bi rêya çalakiyên ku bihêlin pirtûk bi hêsanî ber bi her alî ve bêne belavkirin û peydakirin.

Her wiha dê bibe sedema têvedan û piştgiriya weşanxane û dezgehên çandî ji bo berfirehkirina tevgera weşangerî û wergerê, û birêxistinkirina wê tevgerê da ku xwe bighîne asta cîhanî. Ew jî bi rêya tevlêkirina bîrmend û nivîskarên pispor, û sazkirina bername û planên ku dihêle hemû aliyên raman û zanistê bigire nava xwe.

Bi rêya pêşangehên pirtûkan derfet çê dibe ku hevdîtin û diyalog di navbera weşanxane û xwendevanan de û di navbera wan û berpirsên karûbarên çandî û perwerdeyî de pêk bên, da ku qada xwendinê û tevgera weşanê mezintir û berferehtir bibe.

Pêşangehên pirtûkan derfetê didin ku di navbera weşanxane, kesên ku bi çandê re mijûl in û nivîskaran de awayên hevkariyê pêş bikevin da ku bi hev re arîşe û pirsgirêkan bibînin û derbas bikin û asta pêşangehan bilindtir bikin.

Di nîvê cotmeha vê salê de, tê payin ku 8`mîn Pêşangeha Şehîd Herekol ya Pirtûkan li bajarê Qamişlo bête lidarxistin. Heta hina ev pêşangeh bûye mezintirîn û girîngtirîn çalakiya çandî û rewşenbîrî li ser asta herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Weke hemû xebat û çalakiyan, pêwîst bû ku ev çalakî her sal ji sala berî wê baştir û pêşketîtir bihata lidarxistin. lê tişta mirov dikare bêje ku ev çalakî heme bêje weke xwe ma, şêwe û awayên lidarxistinê, bername û planên çalakiyên girêdayî pêşangehê her weke xwe man, carna jî mixabin kêmtir û qelstir bûn, hijmara çalakiyên li kêlekê (simînar, panêl, imzekirina pirtûkan), di pêvajoya salan de pir kêm û qels bûn. Ev jî rûdaneke bi êş e û ne li gorî bejn û nirxê vê çalakiya mezin û girîng e. Barê pêşxistin û guhertin û başkirina vê çalakiyê pêşî dikeve ser milê aliyên têkildar yên Rêveberiya Xweser, bi taybet desteyên çandê, ku pêwîste li gorî girîngî û nirxê vê pêşangehê piştgiriya diravî jêre terxan bikdin da ku komîteyên amadekar bikaribin bername û planên têr û tije saz bikin.

Komîteya amadekar ya pêşangehê pêwîste ne tenê kesên erkdarên deste û saziyên çandî yên fermî bin. Ji ber ku ew karmend û erkdar ne pisporê lidarxistina van çalakiyan e. Pir girîng e ku weşanxane, yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran, kesayetên rewşenbîr û nivîskar bibin hevparê lidarxistina pêşangehê û hevparê danîna bername û çalakiyên pêşangehê da asta vê çalakiya bi nirx sal bi sal bilindtir bibe.

# Nexweşxaneya Onkolojî, Talasîmya, Pençeşêr û Şewatê

Rêveberiya Nexweşxaneya Heyva Sor a Kurd Hediya Abdullah diyar kir ku pêwîst e hemû rêxistinên navcîhanî û mirovî yên têkildar û kesayetên tenduristî û civakî ku hemû pêdiviyên pêwîst ji amûrên bijîşkî û derman ji nexweşxaneyê re peyda bikin.

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Li herêm zêdetirî deh salan e rewşa ku tê re derbasbuye ji şer û bikaranîna hemû çekên ku bûne sedema hilweşandina binesaziyên petrol û gazê, ew yek jî bû sedema belavbûna gaz û madeyên jehrî di jîngehê de û faktorên din ên aborî-pîşesazî, sosyo-polîtîk, piskolojya civakî û hwd, ji bilî sedemên biyolojîk, rê li ber zêdebûna nexweşiyan vekir ku yek ji wan nexweşiyan di nava civakê weke xeteriyeke cidî tê dîtin, ew jî kansêr e.

Di dema dawî de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêjeyên nexweşiya pençeşêrê zêde bûne. Ji ber rewşa dijwar a nexweşan ji ber dorpêça ku li ser herêmê hatiye ferizkirin û rewşa madî ya lêçûnên çûn û hatinê û….hwd piştî ku lêkolînek li ser rewşa vê nexweşiyê li herêmê hate kirin, Rêxistina Heyva Sor a Kurd biryar da ku nexweşxaneyekê ji bo onkolojîk , şewat û talasemiya li bajarê Qamişlo bi derfetên xwe yên kêm ava bike, nexweşxane di 17 meha Berfenbarê 2023'an da hate vekirin. Lê nexweşxaneyê hîn jî Pêdiviya wê bi amûr, derman û alavên bijîşkî heye da ku nexweşxane bikaribe xizmeta bijîşkî pêşkêşî nexwaşên pençeşêr, şewitandin û thalasaemiya baş bike ku pêwîstiyên nexweşan pêk bîne û tespîtkirina zû bi rêya muayeneya dewrî ji welatiyên herêmê re.

Derbarê Nexweşxaneya pênçeşêr, telasîmiya û şewat Rêveberiya Nexweşxaneya Heyva Sor a Kurd Hediya Abdullah ji Rojnameya me re axivî.



Hediya Abdullah

### Beşên Nexweşxaneyê

Hediya Abdullah di destpêka axaftina xwe de palkişand li ser beşên nexweşxanê û zehmetiyên wê û wiha got: "Nexweşxane ye bençeşêr, telasîmiya û şewat me di 17 meha Berfenbarê 2023'an de hate vekirin. Her wiha armanca me ji vê nexweşxanê re xizmeta nexweşan û barsiv bûyina civakê ye. Di heman demê de Nexweşxane ji sê beşan destpêdike yek ji wan beşan, beşa kansêre ku gav bi gav me xebatên xwe xort kir. Beşa din beşa şewatê ye, lê hîna me dest pê nekirye ji ber ku hindek derfetên me kêmin û di heman demê de beşa Telasîmiya jî heman awayî ye lê di demeke kurt de emê destpêbikin û emê bi awayekî fermî ji bona raya giştî ragihînin. Bêguman nexweşya Telasîmiya nexweşiyeke gelek hesase, ji lewra baldariyek mezin dixwaze û di heman wextî de sebrek mezin divê. Dikarim bibêjim ku em bi awayî rojane rastî zehmetiyan tê, eger kar hebe wê bi xwe re zehmetiyan jî bidê avakirin, lê bi tenê mijara ku me li ser piyan digire û ji bo wê em vî xebatî dikin, sekina civaka me ye, yanî em çavkaniya hêza xwe ji civaka xwe digrin."



Nayîm Îbrahîm

### Zehmetî û astengî

Hediye di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Zehmetiyên ku em bi rengekî rojane rast tên, ne peydakirina hin cureyên dermanan e û di heman demê de hin dermanên ku em peyda dikin jî bi buhayekî mezin tê li ber destê me. Di rastiyê de eger em meze bikin hin saziyên cîhanî hene ku wan dermanan bê fîyat didin. Lê ev ji bo Herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê pir zêde derdekî îfade nakê. Di heman demê de ji ber ku halê heyî siyasetek ne di cih de tê bikar anîn, ji lewra pir zêde lêpirsînekî rast nîne. Li ser vê bingihê em bi hêviya xwe destnîşan dikin ku çi yekî bikaribê alîkar bibe û pêwîst e ku texsîr neke, bi Heyva Sor re bibe destek. Her wiha em di aliyê beşan de jî hijmaran zêde dikin û hewl didin kesên xwedî zanîn peyda bikin.

### Bangewazî

Hediya di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Peydakirina dermanan ji destpêka şoreşê heya niha zehmetî tê dîtin. Bi teybetî eger nexweşiyên Kansêr be hîna di hêla peydakirina dermanên kîmyawî û cerah de zehmetî tê kişandin. Her wiha heye astekî me dermanê kansêr peyda kiriye lê ji ber nirxê wê yê buha, em rêjeyekî gelek kêm distînin, lê em bawerin ku di demeke nêz de ev babet wê çareser bibe. Ji ber vê yekê em bang li hemû rêxistinên navcîhanî û mirovî yên têkildar û kesayetên tenduristî û civakî dikin ku hemû pêdiviyên pêwîst ji amûrên bijîşkî, derman û madeyên bijîşkî yên din ji me re peyda bikin."

### Derfeta dermankirinê roj bi roj zêdetir dibe

Di heman demê de nexweşê telasîmiya yê Nayîm Îbrahîm yê ku bi temenê 20 salî ye di derbarê nexweşxanêyê de wiha got: "Nexweşiya Telasîmiya bi min re heye, her wiha ez ji Îdilbê me, lê halê hazir li Qamişlo jiyan dikim û jiyana xwe di vê cografyayê de derbas dikim. Dikarim bêjim berya niha min li Nexweşxaneya wetenî ya hikûmeta Şamê tedawiya xwe didît, lê ji ber nebûna derfeta min pêwîst dît ku derbasî vê nexweşxanê bibim. Her wiha bi hatina min ya nexweşxana Heyva Sor a Kurd ez gelek heycan bûm û bi germahiyek mezin hatime pêşwazîkirin, derfeta dermankirinê jî roj bi roj zêdetir dibe. Di hêla paqijiyê de jî gelek baldarî heye, di heman demê de bijîşkên nexweşxanê jî bi awayekî pir baş nêzî nexweşan dibin. Yanî di vî alî de kêmanî tune ye, her kes dikare li vê Nexweşxanê tedawî bibe. Di dawî de em ji raya giştî û saziyên ku têne zanîn pêwîst e hem di hêle madî de û hem jî di hêla manewî de ji bo Nexweşxaneya me bibin palpişt."

## Xwenasîn



### Di civakê de temsiliyeta jinê

**Rohat Bulut**

Ji mêj ve ye ku ked, afirînerî, hilberîn û teşedayîna jiyanê ya civakê ku ji hêla jinê ve pêş dikeve ji nedî ve tê. Hişmendiya baviksalarî ya serwer yan jinê tune dihesibîne yan jî wê tune dike. Heke em pê dakevin; nêviyê civak û mirovahiyê ji jinan pêk tê. Jiyan bi kedê teşe digire û xwediyê jiyanê jin e. Em bala xwe didinê ji hilberîna çand û hunerê bigire heta hilberîna xurekan ji hêla jinan ve pêk tê. Hema bêje di afirîneriya hemî nirxan de keda jinê heye.

Lê mixabin ji hêla hişmendiya baviksalarî ve tê tunehesibandin. Lê belê ya girîng û divê bê zanîn ew e ku tunekirin û tunehesibandina jinê di heman demê de tê wateye tunekirin û tunehesibandina civak û mirovahiyê.

Ya pêwîst ew e ku divê hişmendiyeke demokratîk, wekhev û azad bê pêşxistin. Heke hişmendiyeke wiha pêş nekeve xetereya heyî dê civak û mirovahiyê tune bike. Li vir em tenê behsa tunebûneke fizîkî nakin. Heke tunebûna hişmendî û manewî pêş bikeve dê hebûna fîzîkî jî bêwate bimîne. Ji lewre jî divê rewşa heyî ji nû ve baş li ber çavan were girtin û ne tenê formalîtî divê bi esasî hebûna jinê bê qebûlkirin û hemû mafên ku ji dest hatiye girtin lê were vegerandin. Naxwe mirov nikare behsa civakê bike.

Ji bo wê jî divê di her qada jiyanê de jin hebe. Bi taybetî di rêvebirina civakê de. Ji bo temsîliyeta jinan di rêveberiyên herêmî de bê zêdekirin, divê şertê "temsîliyeta herî kêm" bê danîn û sûdwergirtina wan a ji derfetên bajarî bê misogerkirin. Lewre heke nîvê civakê jin be divê temsîliyeteke hevpar û wekhev jî hebe.

Li aliyê din tundiyeke mezin li ser jinê heye. Ji bo pêşî li tundî, tacîz û îstîsmara li ser jinan bê girtin divê plansaziyeke berfireh bê kirin. ji bo wê jî ya herî girîng perwerdehiya civakê ye. Heke hişmendî neyê guherîn dê pêşiya tu tundî, neheqî û destdirêjiyê neyê girtin. Li gel perwerdehiyeke giştî û bi hevsengî divê malên parastin, rehabîlîtasyon û çandê yên jinan, navendên şêwirmendiyê bên vekirin û di vê mijarê de hevkariya bi rêxistinên dildar re bibe erka rêveberiyê.

Aliyekî din jî debare, yanî aboriya malê ye. Heke aborî nebaş be, ev tê wê wateyê ku tevahiya jiyanê nebaş e. Bi taybetî jî di warê madî de. Ji bo vê jî divê xebateke taybet pêş bikeve û ji bo çareseriya aboriyê û derfetên baştirîn ên jiyanê xebat bên kirin. Divê di îstîhdamê de pêşî jin bên bi cih kirin, şert û mercên xebatê bên başkirin. Heke di her qadên aboriyê de jin hebe dê jiyan watedar bibe. Lewre jiyan bi destê jinê teşe digire û bi wate dibe. Lewma jî divê xwediyê gotinê jin be. Em vê jî bibêjin dema mirov behsa temsîliyetê dike, bila şaş neyê fêhmkirin. Temsîliyet divê wekhev be û ne formalîteyî, bi esasî be. Mirov dikare bêje hemû jî bi hişmendiyê ve girêdayî ye û divê ev hişmendî bê guherîn. Bi guherîna hişmendiyê re jî encax dikare civak bigihêje nirxên xwe yên rastîn û bi vê yekê re jin jî dê bigihêje nirxên xwe yên wekhev ên civakî.


# Bi pirtûkxaneya neteweyî çanda Reqayê tê parastin

**Navenda Nûçeyan**

Pirtûkxaneya neteweyî ya Reqayê, piştgiriya kesayetên femînîstên rewşenbîr û kesên bi wêjeyê re têkildar in dike û rola wan xurt dike. Pirtûkxane bi avahiya xwe ya dîrokî balê dikşîne û gelek jin diçin serdana wê.

Pirtûkxaneya neteweyî ya ji aliyê desteya çand û şûnwaran ve hatiye damezrandin, yek ji girîngtirîn cihên çandê ye û ji bo parastina çanda xwendinê navnîşaneke dewlemend e.

Pirtûkxaneya ku 3'yê Cotmeha 2023'yan ji aliyê komîteya çand û şûnwaran ve hatiye vekirin, weke cihê arşîva fikir û dîroka girîngtirîn şaristaniyan tê binavkirin. Di pirtûkxaneyê de 12 hezar pirtûkên makaleyî, yên helbestî û çîrokan hene. Her wiha beşên felsefe dîrok, beşa sînema, huner muzîk û neteweya demokratîk hene. Holeke xwendinê û nivîsandina çîrok û



helbestan jî heye. Tişta balkêş ew e ku avahiya pirtûkxaneyê ji serdema Ebasiyan maye. Bi kevirên kerpîç ên di firinên "Hergla" de li rojavayê Reqayê de hatine çêkirin, avahî hatine avakirin.

'Bajarê Reqayê weke paytexta çandê tê naskirin'

Der barê armanca vekirina pirtûkxaneya yekem a li herêmê de, rêvebera pirtûkxaneya neteweyî Senaa Ebd Ebas got: "Bajarê Reqayê, weke paytexta çandê tê naskirin. Ji ber ku piştî rizgarkirina bajêr ji çeteyên DAIŞ'ê gelek girîngî ji aliyê çandê re hat dayîn ji bo her kes bikaribe behreyên xwe yên çandî derxe û bi pêş bixe."

'Gelek jinên rewşenbîr ji bo me bûne îlham'

Senaa Ebd Ebas der barê xurtkirina rola jinan li herêmê de jî got: "Jinan di hemû aliyên jiyanî, siyasî, civakî, leşkerî û çandî de xwe îsbat kirin. Jin beşdarî gelek şevbuhêrkên helbestî û wêjeyî de her wiha di panelên çandî bûn. Gelek jinên rewşenbîr mîna wêjevana ji nav me barkirî Fewziye El-Meraî û Marya El-Icêlî û Mîdya Silêman ku di gelek karên wêjeyî helbestî û pirtûkan de beşdar bûn hene. Ev jinên wêjevan ji gelek jinên din re bûn mînak."

'Beşdariya jinan a xebatên çandî bû sedem ku baweriya wan zêde bibe'

Senaa Ebd Ebas di berdewama axaftina xwe de wiha anî ziman: "Beşdariya jinan di warê çandî û panelên helbestî de hişt ku baweriya wan bi wan zêde bibe û nêrîna civakê ya ji bo wan were guhertin."

Der barê rêjeya jin û keçên ciwan ên berê xwe didin pirtûkxaneyê de jî got: "Ji dema pirtûkxane vebûye ve heta niha gelek jin û keçên ciwan berê xwe didin vê derê. Di pirtûkxaneyê de holeke taybet ji bo jinan heye. Ew dikarin zêdetir bi vî rengî xwe bi pêş bixin."

Senaa Ebd Ebas got: "Jin bingeha civakê ne û nifşên nû perwerde dikin ji ber wê divê jin zana bin da ku bikaribin malbateke zana ava bikin û bi vê yekê civak şiyar û zana be."

Senaa Ebd Ebas bang li hemû keçên ciwan û jinan kir ku berê xwe bidin pirtûkxaneyê û behreyên xwe yên wêjeyî dewlemend bikin û ji bo planên pêşerojê jî got: "Em hewl didin beşek taybet ji bo wêjeya jinan vekin û panelek ji bo aktîfkirina bername û çalakiyên berdewam, ji bo çand û wêjeya jinan li dar bixin."



# MSD'ê: Kongreya niştîmanî bingeha çareserkirina Kirîza Sûriyê ye

Cîgira hevserokatiya MSD'ê Canda Mihemed, da zanîn ku xwesteka gelên sûrî heye ku kongreyeke netewî were lidarxistin û wiha got: "Em dikarin bêjin heya meha 10'an wê kongreya Hêz û Kesayetên Netewî were pêkwere. Di heman demê de xebat ji bo kongreyek giştî were kirin. Ji ber ku kongireyeke wisa bingeha çareserkirina kirîza Sûriyê ye. "

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Meclisa Sûriyaya Demokratîk(MSD) bênavber hewldanên xwe ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê dike. Ev hewldan jî di rojeva Sûriyê de ne, têkildarî heman mijarê cîgira hevserokatiya MSD'ê Canda Mihemed, bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

**Gelek caran MSD'ê bangewaziya ji bo diyaloga sûrî-sûrî kiriye û hem jî xwestiye hikumeta Şamê û hêzên muxalefetê ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê li hev bicivîne, lê heta niha gavên berbiçav di vî warî de nehatine avêtin, gelo çima?**

Ji destpêka ku MSD'ê di sala 2015'an de hate avakirin û bi şûn de gelek xebat û hewldan ji bo pêkanîna diyaloga sûrî-sûrî û çareserkirina kirîza Sûriyê hatin kirin. Me didîti ku pêwîste aloziya Sûriyê bi riya lihevkirineke siyasî û diyaloga di navbera gelên Sûriyê de were çareserkirin. Lewma jî gelek xebat di vê derbarê de hatin kirin û gelek civîn û komxebat hatin meşandin. Weke civîna Ên Îsa 1, Ên Îsa 2, li Kobanê û li kantona Cizîrê. Gelek kesayet ji



bajar û parêzgehên Sûriyê di van civînan de hazir bûn. Di civînan de jî tiştên girîng ji bo pêşeroja Sûriyê û bidawîkirina kirîza Sûriyê hatin nîqaşkirin. Di heman demê de jî li derveyî Sûriyê jî komxebat li dar ketin û di wan komxebatan de hertim me çareserkirina pirsgirêka Sûriyê dikir mijara bingehîn ji bo nîqaşê. Me hertim digot û hîna jî dibêjin destê me vekirî ye ji bo diyaloga bi hêzên demokrat-netewî, hikumeta Şamê û hêzên ku navê muxalefetê li xwe dikin re. Bi rastî heta niha ti gavên cidî ji aliyê hikumeta Şamê di warê pêkanîna diyalogeke sûrî-sûrî û çareserkirina pirsgirêka Sûriyê de nehatiye avêtin. Sedem jê ew e ku hikumeta Şamê li ser bingehê sîstemeke nijadperestî û navendî hatiye avakirin û ti caran diyalogê qebûl nake.

Li aliyekî din hêzên muxalefetê jî ya ku şoreşek bi navê azadî û rûmeta gelê sûrî dikir, êdî dûrî xwesteka gelên Sûriyê ketin. Êdî ev hêz bûn amûr û komên çete di destê dewletên derdorê di serî de dewleta Tirk a dagirker.

**Heya niha çi guhertinên erênî li ser erdê hene û çi hewldanên we ji bo çaresrkirina kirîza Sûriyê tê kirin?**

Di dema heyî de piştî 13 salan ji kirîza Sûriyê, em dibînin ti çareserî ji pirsgirêka Sûriyê re tune ye, pêkanîna wê jî hinekî dûr e. Ji ber ku dosiyaya Sûriyê di roja îro de ne di nav pilanên herêmî de ye. Bi rastî heya ku alozî bi dawî bibe, pêwîste 3 tişt werin kirin, divê lihevkirineke navnetewî, herêmî û sûrî li ser çareserkirina kirîza Sûriyê were pêkanîn. Ya herî girîng lihevkirina gelên Sûriyê, diyaloga sûrî û berjewendiyên gelên sûrî ye. Lê ji ber ku hêzên navdewletî û dewletên herêmî bi dosiyayên wekî şerê Okraniya-Rûsiya û şerê Israyîl û Hemasê mijûl dibin, dosiyaya Sûriyê hatiye paşguhkirin. Bi dirêjahiya 13 salan ji aloziya Sûriyê bi ti awayî Komkara Erebî û dewletên ereban destwerdan di dosiyaya Sûriyê de nedikir. Di van salên dawî de hin dewletê ereban têkiliyan bi hikumeta Şamê re çêdikin. Lê pêwîste ne tenê bi hikumeta Şamê re danûstandin çêbibin, divê têkiliyên wan bi hemû gelên Sûriyê re pêk werin. Me weke MSD'ê dît ku ev hewldan bi tena xwe aloziya Sûriyê çareser nake û pêwîste gelên sûrî li ser çareseriyekê ji bo aloziya Sûriyê erê bikin. Lewma ji bo ku ev yek pêk were em niha gelek Desteyên Diyaloga Netewî, li Helebê û gelek deverên din çêkirine. Lihevkirinek tê çêkirin li ser bingeha yekîtiya axa Sûriyê û hem tê erêkirin ku çareserî ne li gor sîstema navendî be, lê belê li ser esasê sîstemeke demokratî were pêkanîn.

**Çav hemû li ser MSD'ê ne ku pêşengtiya van hevdîtinan bike, heta ku kongreyeke netewî ji bo hemû aliyên sûrî were lidarxistin, bangewaziya we ji bo hikumeta Şamê û hêzên sûrî çi ye?**

Di dema heyî de xwesteka gelên sûrî heye ku kongreyeke netewî were lidarxistin, bi mercê ku hemû hêz û aliyên sûrî di çareserkirina kirîza Sûriyê de beşdar be. Helbet eger wiha pêk were wê çareseriya kirîza Sûriyê pêkan be. Lewma jî armanca me ew e ku em kongreyeke netewî ji bo hemû gelên Sûriyê li dar bixin. Ji ber ku dema em bêjin kongreyeke netewî, divê hemû aliyên sûrî tê de beşdar bibin. Lê di dema heyî de li darxistina kongreyekî giştî pir zehmet e, ev nayê wateya ku bangewaziya MSD'ê radiweste, lê belê hertim bangewaziya diyalog û çareseriyê dikin. Bi rastî heta astekê gelên Sûriyê û hin aliyên netewî yên sûrî gihaştine wê baweriyê ku diyaloga sûrî, Rêveberiya Xweser û MSD'ê ne. Lê hertim hikumeta Şamê û hêzên Muxalefetê xwe dûrî diyalogê dixin, em weke MSD'ê jî hertim ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê kar bikin û wê hewldanên me ji bo pêkanîna diyaloga sûrî-sûrî ranewstin. Li aliyekî din em niha amadekariya lidarxistina kongireyeka Hêz û Kesayetên Netewî dikin. Ev 3 sal in ku em hewla lidarxistina vê kongreyê dikin, lê ev yek ne bi hêsanî pêkwere, lewma ji ber ku em rewş û şertên zehmet dijîn, ev kongire dereng ma. Em dikarin bêjin heya meha 10'an wê kongreya Hêz û Kesayetên Netewî pêkwere û li ser asasê pêşeroja Sûriyê çareserkirina kirîzê, nîqaş werin kirin.

# Esaleta Napolyon û Rezaleta Mesrûr Barzanî



**Volqan Elî**

Tê gotin reklama ne baş tine ye. Bixwazî nexwazî mirov dide fikirandin. Serenavekî wisa çiqas rast dibe? gelo mirov navekî din lê kirana ne baştir bû? werhasil… tê zanîn bi lêv nekiribe jî Napolyon Bonapart wekî yek ji pratîsyenên netewe-dewletê tê hesibandin. Di wan serdeman de Franse wekî dergûşa şidet, alozî, mirin, kuştin û terorê ye. Salên wisa ne ku di her kêliya wê de li Ewrûpayê û bi taybetî jî li Franseyê hezar firtone û tufan diqewimin. Hem şoreş, guherîn û hem jî zora paşverûtî tê jiyîn.

di wan mercên Franseyê de gelek leheng, zordar û xiyanet heye. Hemû di nav hev de ne. Va ji van yek jî Napolyon e. Lehengekî dema xwe ye. Ji bo Fransaya 1789'an wisa ye. Yên dîroka şoreşan kêm jî be eger bihîstibin, dizanin Napolyon kesayetiyekî wisaye ku zêde ji pergala berê ya Franseyê hez nake. Di dîroka şer de wekî taktîsyenekî mezin tê zanîn. Ji vê bêhtir jî di avakirina Fransa nûjen de xwediyê rol e.

Xwendevan wê bêjin çi eleqa eseleta Napolyon bi Barzanî re heye. Wele hûn rast dibêjin. Divê mirov li xwe mukur were. Wekî min destpêkê jî gotiye 'reklama ne baş nabe'. Kurdiya vê jî bav û kalan gotiye, "navê golikê biçûk e lê garanekê xira dike". yanî dema tiştekî baş hebe, encax dikare tu wê bi ya herî xirab bidî naskirin. Ji derveyê wê zehmet e. Tiştê xirab çendî biçûk be jî navê başiyê xirab dike.

Ya din jî em ê werin aliyê polîtîk. Çawa yanî. Ka vê PDK'yê digot, "em ê Kurdistana serbixwe ava bikin", referandum kirin. Xwestin Kurdan bixapînin. Niha jî di medyaya dijîtal de dibêjin "tenê em dikarin li Kurdan xwedî derkevin". Vayê di vê kêliyê de Napolyon tê bîra mirov. Wî li gorî pratîka netewe-dewletê tevger kiribû. Di serdema xwe de qehremanê welatê xwe bû. Kesayetiyeke wisa ya xweser e. Ti car li beramberê dijminê xwe seriyê xwe netewandiye. Her daye pey armanca xwe. Lê Mesrûr Barzanî û malbata wî çi dike? daye li pey armancên Dewlet Bahçeli û faşîma Erdoğan.

Di vê derê de çîrokek qedîm a Kurdan tê bîra mirov. Piştî xiyaneta Harpagos, Astiyag jê re dibêje "hey rezîlê rezîl, te her xiyanet kiriye. Ma te taca me Medan çima da li serê Persên ku heya bi doh li ber deriyê me xizmetkar bûn, qe nebe te taca qraltiyê bixista serê xwe". Rewşa vê malbatê bi vî şiklî trajî-komîk e, bi vî şiklî ye.

Em dîsa vegerin li Napolyonê bi esalet. Resenî yan jî esaleta wî li ku ye? Bi rastî jî orjînal e, resen e; ya ku difikire pê de diçe. Ya din jî feylesofekî wekî Hegel felsefeya xwe ya netew-dewletê bi wî şîrove dike û ji bo wî dibêje, "Netewe-dewlet ew Xwedayê li ser rûyê erdê dimeşe, Napolyon jî temsîla wî ye". Napolyon şexsiyeteke wisa ye, bi pratîka xwe ya heyî ji feylesofekî wekî Hegel re bûye çavkaniya îlhamê. Ji ber vê yekê bi esalet e, resen û orjînal e. Lê Harpagos, na biborin Mesrûr û malbata wî ya malûm, çi dike? Dagirkeriya Tirk bi sedan tang, balafir, helîkopter, bi sedhezaran leşker, parçeyê Başûr dagir dike ne ku tenê tiştekî nabêje. Bi heman şiklê Harpagos û Enkîdo, dibêje "dagir bike, bikuje". ma çima tu dagirker tînî? Dar û daristanên Dihokê û Metîna dişewtînî? Jixwe tu li Başûr bûyî. Tu bihata Metîna, nizanim ku derê. Jixwe cihê te li Kanîmasî û li gelek cihan hebû. Li Bajaran jî desthilatdariya te hebû. Eger wekî tu dibêjî Tevgera Azadiyê û gerîla pirsgirêk bûya, dema ku tu hatibûya wê li dijî te şer bikirana? Na! heta niha jî gerîla, tevgera azadiyê kevir û kuç danîne ser dilê xwe rûxmî ev çend xiyanetê sebir dike. Eger wekî tu dibêjî gerîlayên Azadiya Kurdistanê pirsgirêk bûna, ew qas rêxistinên Kurdan, rewşenbîr û gelê Kurd heye tu biçûya te giliyên xwe ji wan re bikira. Ma çima tu diçî gurên boz ên devbixwîn, cîhadîstan ber didî li ser dilê welat? Rojên borî, suîqasta li dijî Trump şermezar dikir. Bila! Lê dagirkerî her roj gund û gundiyên Kurd qetl dike, jixwe şermezar nakî, çima jê re rê çêdikî?

"ku gerîla û Tevgera Azadiyê li Başûr pirsgirêk e, dibe sedem ku Tirk êrîşî Başur bikin", dereweke mezin e. Xiyanet rastî û heqîqetê vedişêre. dema ku heqîqet li holê namîne jî, derew û rezalet hakim dibe! Rezaleta malbata Barzanî esaleta Napolyonê ku ruhê netewdewletê ye jî diherimîne!

# Peymana Lozanê plana qirkirina gelê kurd e


Gelê kurd hîna daxwaza bidestxistina mafên xwe yê rewa û Kurdistana yekbûyî dike. Piştî ku ew xewn li ser îmzekirina peymana Lozanê ji holê hat rakirin û gelê kurd di bin hegemoniya Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûriyê de hate hiştin. Gelo navaroka vê peymanê çi ye û Tirkiyê niha çi plan dike?

Amara Baran/Qamişlo

Piştî têkçûna desthilatdariya Osmanî di dawiya şerê cîhanê yê yekemîn de, bi saya peymana "Sevr" a sala 1920`an ku tekezî bi mafê Kurdan ê diyarkirina çarenûsa xwe kir, gelê Kurd nêzî pêkanîna xewna xwe ya avakirina Kurdistanê bû.
Piştî têkçûna dewleta Osmanî di şerê cîhanê yê yekemîn de, dewleta Osmanî hate neçarkirin ku bi dewletên serketî re di 10`ê Tebaxa 1920`an de peymana Sevrê îmze bike.
Li gorî vê peymana ku li bajarê Sevr ê Frasnayê hate îmzekirin de, hevalbendan sînorên dewleta Osmanî teng kirin û tenên herêmên ku bi zimanê Tirkî diaxivin di bin serweriya wê de hiştin. Vê yekê û li gorî bendên 62, 64 ên beşê sêyemîn ê peymanê, rê da gelê Kurd ku çarenûsa xwe diyar bikin û Kurdistanê ava bikin.

### Soz pêk nehatıin û li ser înkarkirina nasnameya kurdî li hev kirin

Di destpêka sala 1920`an bi serkêşiya Mustafa Kemal Ataturk netewperestan pêşketinek di "şerê serxwebûnê" de bi dest xistin. Vê yekê Ataturk teşwîq kir ku peymana Sevrê û sozên ji bo Kurdan, bi dawî bike. Ataturk piştrast kir ku ew avakirina dewleta Kurdistanê red dike û ji bo îmhakirina nasnameya Kurdî û tunekirina wan di civaka Tirkî de dest bi siyasetên tirkkirinê li dijî Kurdan kir.
Piştî wê hêzên hevalbend "Brîtanya, Fransa, Îtalya, Japon, Romaniya, Bûlgarîstan, Pirtugal, Belçîka, Yogsilaviya" neçar man ji bendên peymana Sevrê paşve vekişin û bi peymana "Lozanê 1923" guhertin. Bi îmzekirina Lozanê re gelê Kurd ket bin serweriya Tirkiyê, Îranê û hêzên Brîtanya û Fransayê ku Irqa û Sûriyê mêtînger kiribûn. Gelek bendên peymana Lozanê hebûn, lê belê tu bendên girêdayî Kurdan nehatin bibîrxistin. Hin madeyên giştî ku tekeziyê bi parastina mafên hemû welatiyên Tirkiyê bêyî cudabûna netewî, çandî û nasnameya wan dike hatin danîn. Her wiha hat gotin mafên hemû welatiyan heye ku bi serbestî bi zimanê dayikê biaxivin. Lê belê piştre qonaxa înkarkirina nasnameya Kurdî û qirkirina çandî û fîzîkî ku heta roja me dewam dike, li dijî Kurdan dest pê kir.
Ev peyman wekî rewakirina



dûrxistina Kurdan ji nexşeya siyasî û xeternaktirîn peymana ku Kurdistan parçe kiriye, tê hesibandin. Di wê der barê de, Rêber Abdullah Ocalan di parêznameya pêncemîn a bi navê Şaristaniya Demokratîk-Doza Kurdî de wiha nirxand: "Bi îmzekirina peymana Lozanê û ragihandina komarê re, qonaxeke nû dest pê dike. Bi îmzekirina peymaneke xeternak li dijî Kurdan, dixwazin nakokiyên domdar bi Brîtanyayê re yên girêdayî Mûsil û Kerkukê bi dawî bikin."
Rêber Abdullah Ocalan wiha nirxandina mijarê dewam dike: "Peymana Enqere ya bi Fransayê re tevî pêşkêşkirina tewîzan ji Mîsaqa Millî, bandorên xeternak bi xwe re neanî. Her wiha di serdema Fransayê de parçeyekî biçûk hişt."
Tevî ku mêtîngeran Kurdistanê dagir kirin, lê kurdan di aliyên leşkerî û çandî de karîbûn xwe biparêzin. Dema dewleta Tirk a dagirker di siyasetên xwe yên dagirkirinê de bin ket, siyaseta parçekirina Kurdistanê di navbera xwe de pêk anîn. Kurdistan di navbera Osmanî û Îranê de li gorî Peymana Qesra Şêrîn a 1639 bû 2 parçe û di 24'ê Tîrmeha 1923'yan de li gorî Peymana Lozanê ya ku piştî peymana Sykes - Picot hatiye îmzekirin, bû 4 parçe.

### Lozan û planên dewleta tirk ên qirkirina kurdan

Destpêkê ji peymana Severs de bû. Peyman piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn di 10'ê Tebaxa 1920'an de li bajarê Severs ê Fransayê hate îmzekirin. Ne ji wê peymanê bûya, wê bajarên Trabzon, Amed, Erzîrom, Izmîr, Idirnê, Tekirdag û Dîlok derveyî xaka Tirkiyê bûna. Bi vê peymanê xaka Tirkiyê mîna peymana Sykes – Picot û bi hemû şertên peymana Versailles a Almaniya ya 1919'an hate parçekirin. Brîtanya, Fransa, Îtaliya û Yewnanistanê bajarên Tirkiyê parçe kirin û her herêmeke bi zimanê tirkî naaxivin ji serweriya Osmanî derxist û tev li Nîvgirava Ereban, herêmên Tirkiyê û herêmên Artodoks, yewnanistanî, ermenî û kurdî yên li rojhilat kirin.
Beriya vê peymanê di sala 1919'an de, dewleta Tirk şerê li dijî hêzên hevalbend ên ku bi şerê serxwebûnê tên naskirin, da destpêkirin û wan ji tevahî herêmên di bin kontrola wan ên di çarçoveya peymana Seversê de derxistin. Ji ber vê yekê hevlabendan neçar man ku li gorî rewşa nû careke din danûstandin pêk bînin. Di encamê de di salal 1912'an peymana Lozana duyemîn bi Îtalyayê hat îmzekirin, ku li gorî osmanî ji Lîbyayê vekişin.
Vê peymanê hişt aliyê navneteweyî komara Tirkiyê û nexşeyeke nû nas bike ku li şûna dewleta Osmanî bû mîras. Ew yek jî piştî ku xeta sînor a bakurê Sûriyê tev li xaka wê bû û herêmên din mîna Mûsil û parçeyên din ji Ewropa rojhilat hatin qutkirin.
Peymanê sînorên gelek dewletan mîna Yewnanistan, Bulgariya, Tirkiye, Sûriyê û Iraqê diyar kirin û Tirkiyê jî dev ji xwestekên xwe yên giravên Dodecanese û Qibrisê û îmtîyazên xwe yên li Misirê, Sûdan û parçeyên ji Iraqê berda. Her wiha dewleta Tirk li gorî benda 10'an a peymana Oshî ya di navbera dewleta Osmanî û Îtaliya de di 1912'yan de hate îmzekirin, Lîbya jî hişt.
Li beramber wê jî ji nû ve sînora bi Sûriyê re hate nexşekirin, ku herêmên berfirehê ji rojava heta bi rojhilatê bajar û herêmên Mêrsîn û Antakya û herêmên Kurdistanê; Dîlok, Kilis, Mereş, Riha, Heran, Amed, Mêrdîn, Nisêbîn û Cizîra Botanê di nav xwe de digre.
Di vê peymanê de tevî ku dewleta Tirk dît ku zirar pê bûye û fatora dagirkeriya Osmanî di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de daye, lê aliyê herî zêde ziyan dît Kurd bû. Kurdan tu maf bi dest nexistin û bi planên Tirkiyê û komployên bi dewletên ku peyman îmze kirine re hatin dûrxistin.

### Temamkirina plana tunekirina kurdan

Piştî Kurdistanê bû 4 parçe, dewleta Tirk bi rêya plana Şerq Îslahê siyaseta tunekirina kurdan meşand. Ji 1925'an ve bi awayekî eşkere dest bi komkujiyên li dijî gelê Kurd, li Qoçkirî, Dêrsim û Zîlanê kir. Li vir nesekinî, lê pêşeng û serokên kurdan ên navdar mîna Seyid Riza û hevrêyên wî bi dar vekirin. Dewleta Tirk di siyaseta xwe ya tirkkirina Kurdistanê û valakirina wê de berdewam kir, her wiha kiryarên koçberkirin, girtin û valakirina gundan bi lez pêk anî. Girêdayî wê yekê Rêber Abdullahn Ocalan di parêznameya xwe ya 5'an de ya 'Pirsgirêka Kurdî û Çareseriya Neteweya Demokratîk de' dibêje: "Bi îmzekirina Peymana Lozanê û îlana Komarê re qonaxeke nû dest pê dike. Arîşeya Mûsil û Kerkûkê ya bi Ingilîzan re dewam dikir, hewl dan bi peymaneke gelekî trajîk a li dijî Kurdan bigihînin encamê. Peymana Enqereyê ya bi Fransiyan re herçiqasî ji Mîsaq-î Millî paşvegavavêtinek bû û hinekî jî li dijî Kurdan û Tirkmenên li Sûrî bi encam bûbe jî di asta felaketê de pêk nehatiye. Beşekî Kurdistanê ji Franseyê re hatiye hiştin. Lê ji ber neyêniyên wê yên li ser rastiya netewe ya Kurd divê mirov bi girîngî li ser raweste.
Li ser bingehê avakirina Iraqê Kurdistan hat parçekirin û ev bi awayekî eşkere binpêkirina Mîsaq-î Millî bû. Vê bûyerê li Parlementa Tirkiyê û di navbera Kurdan de rê li ber tengezariyeke mezin vekir. Ev peymana di 5'ê Hezîrana 1926'an de bi Ingilîzan re hatiye mohrkirin, gelek aliyên wê yên tarî hene. Şert e ku mirov vê peymanê weke destpêka dîroka qirkirina Kurdan binirxîne."
Ji her kesî ve niyetên Enqere eşkere ne û gelek caran li ser nexşeya "Mîsaqî Millî" ku ji ber Lozanê ji dest daye, diaxive û dibêje Mûsil, Kerkûk heta bi Hewlêrê mafên wê ye. Ji ber wê "Projeya Aştiyê" a bi Tevgera Rizgariya Kurdistanê re di 30'yê Cotmeha 2015'an de têk bir. Meclisa Ewlehiya Neteweyî plana " çöktürme" danî. Her wiha HDP'ê di 5'ê Nîsana 2015'an de ku hevdîtina dawî bû, bi rêber Ocalan re civiya. Piştî wê yekser dewleta Tirk hemû hewlên ji hêla rêber Ocalan ve ji bo çarekirina doza Kurd bi rêbazên siyasî, têk birin. Di 24'ê Tîrmeha 2015'an de dewleta Tirk dest bi êrişeke berfireh li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê kir û bi 72 balafirên şer herêmên Qendîl, Zagros, Behdînan, Zap, Garê, Heftanîn, Basiya, Metîna û Avaşîn bombebaran kirin, di heman demê de bi kûrahiya 40 kîlometre derbasî xaka Başûrê Kurdistanê bû, zêdetirî 35 baregehên leşkerî ava kirin û serweriya xwe ya leşkerî û siyasî li Kerkûrê bi rêya eniyên tirkmenî yên alîgir fireh kir. Li Mûsilê jî bi rêya hêzên sunnî yên erka xwe dan û standina bi DAIŞ'ê re ne fireh kir.
Li Rojavayê Kurdistanê jî, dewleta Tirk a dagirker di 2018'an de êrişî Efrînê kir, di 2019'an de êrişî Serêkaniyê û Girê Spî kir, di encamê de ew herêm dagir kirin. Ji ber van êrişan bi sed hezaran Kurd hatin koçberkirin û bi hezaran şehîd bûn. Hîna jî êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li ser herêmên nêzî sînor û hedefgirtina sivîlan nesekinîne.

### Civîna madrîdê lozana duyemîn e

Ruxmî gelek sal derbas bûn, hîna jî hêzên navneteweyî berjewendiyên xwe li ser hesabê kurdan pêk tînin. Dewleta Tirk, hêzên rojava der barê tevlêbûna Swêd û Fînlandiyayê li NATO'yê de li beramber hevkariya bi wê re li dijî çalakgerên Kurd li van her du dewletan, şantaj kir. Sekreterê Giştî yê NATO'yê Jens Stoltenberg ragihandibû ku dewleta Tirk li ser destekdayîna hewlên Fînlandiya û Swêdê yên ji bo tevlêbûna li NATO'yê erê kirin, ew jî piştî îmzekirina muzakereya sêalî ya bi rêya civîna Madrîdê pêk hat.
Di hemû xalên peymanê de de dijminahiya li Tevgera Rizgariya Kurdistanê û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin destnîşankirin. Her wiha ji Fînlandiya û Swêd hate xwestin ku şoreşgerên Kurd û alîgirên rêxistina Fethullah Gulen radestî Tirkiyê bikin û destekên xwe ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê re rawestînin. Yek ji şertên din ên dewleta Tirk jî PKK'ê weke "rêxistineke terorî" were naskirin û qedexeya firtona çekan ji Tirkiyê re were rakirin.



# 'Lihevkirina Erdogan û Esed li dijî berjewendiyên gelên Sûriyê ye'

Piştî 13 salan ji talankirin û qirkirina gelan; Erdoxan û Esed careke din ber bi lihevkirinekê ve diçin. Hevserokê Partiya Sûriye Pêşeroj li Kantona Efrîn û Şehbayê Mihemed Bêrem destnîşan kir ku hevdîtinên di navbera Erdogan û Esed de eger bên kirin, wê li dijî berjewndiyên gelên Sûriyê be.

Zana Roj/ Şehba

Serhildana gelên Sûriyê ku veguherî pilanên herî xirab û hemû pîvanên mirovahiyê hatine binpêkirin. Li dijî gelan qirkirin, talankirin û koçberkirin bêserûber hatiye kirin.
Piştî ewqas destwerdanên hêzên dagirker, îro li ser hesabê rijandina xwîna gelên Sûriyê banga lihevkirirnên di navbera hikumeta Şamê û dewleta Tirk a dagirker tê kirin. Erdoganê ku bûbû sedem û alîgirê yekemîn di perçekirina xaka Sûriyê û berbatkirina gelê wê de, bang li Essed dike ku piştî 13 li ser masaye lihevkirinê rûn in. Têkildarî mijarê û planên ku tên gerandin, hevserokê Partiya Sûriya Pêşeroj li Kantona Efrîn û Şehbayê Mihemed Bêrem ji rojnameya me re axivî.

### `Tirkiyê temenê aloziya Sûriyê dirêj kir`

Mihemed anî ziman ku Tirkiyê rola sereke di dirêjkirina aloziya Sûriyê de leyist û wiha got: "Dagirkeriya Tirk siyaseta xwe li ser xwîna gelên Rojhilata Navîn ava kiriye. Piştî hilweşandina Iparatoriya Osmanî her du dewletên Tirkiyê û Sûriyê encama peymana Sayks Piko ne û her du dewlet jî aloziyên cîhanî jiyan dikin. Dewleta Tirk alîkarê yekemîn di perçekirina xaka Sûriyê, tallankirina wê û xwînrijandina bi milyonan ji gelên Sûriyê ye. Dagirkeriya Tirkiyê di nava xwe de hilweşandineke cidî jiyan dike û êdî aloziyên navxweyî kurtir dibe, ji bo derbaskirina van hilweşandinan û piştî derbasbûna zêdetirî 13 salan li ser pilan û siyasetên qirêj Erdoxan banga lihevkirinan bi Esed re dike. Erdogan bi pilanên xwe yên qirêj û derxistina şoreşa Sûriyê ji riya wê ya rast û parastina berjewendiyên xwe li ser pişta gelê Sûriyê, rola herî serek û dirêjkirina temenê aloziya sûriyê de leyist. Di 13 salan de Erdogan sûcdarê herî mezin di talankirina gelê herêmê de ye."

### `Nêzîkbûn nakevin xizmeta gelên Sûriyê de`

Mihemed diyar kir ku piştî têkçûna siyaseta dagirkeriya Tirk, ew niha dixwaze bi riya nêzîkbûna bi hikumeta Şamê re siyasetên xwe dewam bike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dagirkeirya Tirkiyê piştî alozî, windakirin û qeyranên ku di nava xwe jiyan kiriye, her wiha bi bûyera Qeyserê û pêkanînên sûcên dijmirovan ya ku bandoreke mezin li ser siyaseta wî bi derve-re kiriye. Me dît ku Tirkiyê ji bo pêhtir zirarê nebîne û têkiliyên xwe biparêze silogana na ji pirisgirêkan bi dewletên cîran re rakir. Banga wî ji Esed re û vegerandina têkiliyan di van hevdîtinan wê tu sûdê li berjewendiyên tavahî gelê Sûriyê yên herêmên dagirkirî û yên bi Esed re neke. Ev nêzîkbûn careke din dikevin xizmeta berjewendiyên her du hikumetan".

### `Gelê Sûriyê wê planên wan qebûl neke`

Mihemed di dirêjahiya axaftina xwe de wiha got: "Ev gavên ku weke çareserî dibînin, tu tiştî wê çareser neke. Çaraseriya bingehîn ji alioziya Sûriyê re ew pêkanîna biryara navnetewî ya Cinêf ê ya 2254 e. ji ber wê em dibêjin ev pilan û hevdîtin careke din li ser hesabê gel tê kirin û mafê gelê Sûriyê yê ku zêdetirî 8 milyon Şehîd û zêdetirî 14 milyon kes koçber û penaber bûne venagerîne. Gelê Sûriyê bi van çareseriyên perçekirî qebûl nake çareserî di vegerandina tavahî koçberên ku derketine her wiha derxistina



tavahî hêzên dagirker û vekirina riya diyalogê ya rast bi tevahî pêkhateyên di Sûriyê de jiyan dikin re, li dûrî tavahî ecîndatên dewletên navnetewî yên kapîtalîst û dagirker".

### `Divê gelê Sûriyê nekeve xefkê`

Mihemed Bêrem di dawiya axaftina xwe de bang li hemû gelê Sûriyê kir û wiha got: "Em bang li tavahî gelê Sûriyê dikin ku bi van pilan û siyasetan nexapin, da ku careke din nekevin xefka pilanan û nebin qurbanî ji siyaset û berjewendiyan re. Her wiha em bang li tavahî hêz, pêkhate û Opozisyona ku rastî bi mafê gelê Sûriyê difikir ku bibin yek enî da ku hemû hêzên dagirker ji xaka Sûriyê derbixînin û çareseriyeke bingehîn ji vê aloziyê re bibînin".

## Ronakkirina gel neçariyek e



Zekî Bedran

Em hewl didin bînin ziman ku rêveberiya Erdogan ji bo polîtîkaya qirkirinê ya li dijî Kurdan bi encam bike, xebatên êrişên piralî û propogandayê bilez dike. Yek ji aliyê girîng ê van xebatan jî Sûriye ye. Erdogan bûyerên bi Bihara Ereban re destpêkirin ji xwe re derfet dît û xwest di ser Ixwaniyan re welatên Ereb bixe bin venêrîna xwe. Ji ber wê jî bi rêxistinên weke DAIŞ û El- Nûsrayê re tifaq çêkir. Hesab kir ku dê rêveberiya Baasê hilweşe. Sûriye kişand nava zivrînokek bi xwîn. Erdogan digot, em nakevin şaştiya ku me di sala 2003'an de li Iraqê kiriye, emê nehêlin Kurd bibin xwedî statû. Heman demê de dê Ixwanî jî anîbûna ser desthilatê û Sûriye xistibûya bin venêrîna xwe.
Lê hesabên Erdogan pêk nehatin. Kurdan li ber xwe da û rolek mezin di binxistina DAIŞ'ê de lîstin. Vê berxwedanê heman demê de rolek herî mezin di neketina rêveberiya Esad de lîst. Heman demê de Esad jî li ber xwe da, bi piştgiriya Rûsya û Îranê li ser piyan ma. Li gel van hemûyan jî dîsa dewleta Tirk artêşa xwe xiste Sûriyê. Herêmên weke Efrîn, Bab, Ezaz û Serê Kaniyê dagir kir. Li van herêman tam aboriyek talan û xenîmetê ava kir. Bi dehhezaran hêzên çekdar li vir birêxistin kir û şande ser serê gel. Tu sûcê şer û mirovayiyê nema ku nekir.
Erdogan ji bo ku encama dixwest bi dest nexist niha jî ji Esad re dibêje were em li hev bikin. Aştiya Tirk çawa dibe, em dikarin li Qibrisê binêrin û fêm bikin. Weke tê zanîn Qibris weke dewlet endamê Neteweyên Yekbûyî ye. Heman demê de endamê Yekîtiya Ewropayê jî ye. Ji sala 1974'an ve Qibris di bin dagirkeriya Tirkiyê de ye. Li gel tevayî biryar û hewldanên NY û YE yê jî Tirkiyê leşkerên xwe ji Qibrisê venekişand. Qibrisa ku dewletek biçûk a giravê ye, Tirkiye li wir çareseriya federal jî napejirîne. Ji bo dused hezar Tirkên li Qibrisê dewletek cuda li cîhanê ferz dikin. Dibêjin ku ji bo Filistiyan dewletek cuda dixwazin. Lê dema dor tê Kurdan dibêjin na, di vê cîhanê de nabe ku statû û navek ê Kurdan hebe û kesek nikare vê biparêz e. Qiyametê radikin.
Beriya çend rojan salvegera dagirkirina Qibrisê bû. Tevayî rêveberên dewletê û nûnerên partiyan ji bo pîrozkirina dagirkeriyê li Qibrisê rêz bûn. Tam kevneşopiyek a Tirk bû. Li gel ku bi sedan sale di ser dagirkirina Istenbolê re derbas bûye jî hîna dagirkirinê pîroz dikin! Dikarin li van merasîma binêrin û bizanin ku nêrîna Erdogan û Baxçelî çi ye. Baxçelî û mafyayê di bin destê wî de Alladîn Çakici bi qaşo fermandarê Artêşa Azad a Sûriyê re pozan didin û wêneyan digirin. Karê muxalefeta Sûriyê li gel partiyek Tirk a faşîst û nîjadperest çi ye? Ev dîmen tenê têrê dikin ku bê fêmkirin xwedî kîjan nêrînê ne.
Artêşa Azad a Sûriyê û muxalefeta Sûriyê di destê Tirkiyê de veguheriye pîyoneke asayî û cerdevanan. Ev nebûn hêzek ku pirsgirêkên gelê Sûriyê bînin ziman û demokrasiyê bixwazin. Heta di hembêza Tirkiyê de rûnin jî nabin hêzek wiha. Ev dikarin tenê weke amûrekî ji bo êrişên Tirkiyê li hemberî Sûriyê û dagirkirina herêmên nû xizmetê bikin. Nasnameyek van a siyasî û vîna wan tune ye. Hebûna wan girêdayî dagirkeriya Tirk e. Ji ber ku pişta xwe naspêrin gel. Bi xêra dewleta Tirk milkê gel talan kirine û bûne axayên şer û xwe ji şer têr dikin. Dibêjin eger Tirkiye û Sûriye li hev bikin dê me ji dest derxin, ketine tirsa vê. Ji ber vê jî xwe diavêjin hembêza faşîstên weke Baxçelî. Ketine nava lêgerînan û dibêjin "dagirkeriyê bi dawî nekin, li herêmê me bikar bînin". Erdogan dixwaze bi rêveberiya Sûriyê re li hev bike, hem ji penaberan xilas bibe hem jî ji Kurdan xilas bibe. Dibêje, "tu ji başûr ve ezê ji bakur ve êrişî Kurdan bikim, wan teng bikin". Yanî li Sûriye ne aştiyê kevirê şer û pevçûnên nû datîne. Ji bo vê jî istixbarata wî bi awayek aktîf kar dike. Gundên li ser sînor bê navber tên topbarankirin. Taybet jî ji bo di navbera gelê Kurd û Ereb de nakokiyan çêbike, eşîran bikişkişîne xebatek giran dimeşîne. Çeteyên li herêmên dagirkirî jî li dijî Kurdan gij dike û ji şer re amede dike. Sozê dide wan û dibêje, "Em van herêman dagir bikin, hûnê lê bi cih bibin û bihêz bibin. Dê milkê wan ji we re bimîne, hûnê jî bi rejîmê re bazarê bikin û dê we efû bike. Emê we bi şêweyekî bixin nava desthilatê".
Eger DYE ji herêmê vekişe dê karê Tirkiyê zehmet be. Ji ber wê jî ji bo lihevkirina bi Esad re lez dike. Weke tê dîtin hewldan û planên Tirkiyê pir xeter in. Di vî alî de pêwîste rêveberiya xweser û hêzên demokratîk tiştên çêdibin bi baldarî bişopînin û ragihînin gelên cîhanê. Cîhan niha nizane çi li herêmê çêdibe. Tirkiye hertim propogandaya têkoşîna li dijî terorê dike. Ji ber ku bala cîhanê li şerê li Filistîn û Ukraynayê ye, faşîzma Tirk sûdê ji vê digire û dixwaze li Sûriyê qirkirina Kurdan pêk bîne, rêveberiya xweser ji holê rake.

## Hedefên Dagirkeriyê



Farûk Sakik

Dema ku di 24'ê Tîrmeha 2015'an de 72 balafirên dewleta Tirk a dagirker dest bi bombebarana Herêmên Parastinê yên Medyayê kirin, şerê li hemberî Kurdan derbasî qonaxeke nû bû.
Plana ku di cotmeha 2014'an de di MGK de hatibû nîqaşkirin ew roj xistin meriyetê.
Ev şer wê êdî neşibiya şerên berê. Ev yek di meha Nîsanê de dema hevdîtina herî dawî bi Rêber Apo re hat çêkirin de hatibû destnîşan kirin. Rêber Apo digot; ev şerê ku wê dest pê bike wê bibe sedemên gelek êşên mezin û ev nêrînên wî rast derketin. Anha ev şer bû sedema gelek felaketên mezin. Bajar hatin rûxandin, mirov hatin qetilkirin, xweza hat tarûmarkirin, çekên kîmyewî hatin bikaranîn, koçberiyê dest pê kir. Li Rojava heroj balafiran êrîş kirin, herêm hatin dagirkirin û demografî hat guhertin. Ev yek li Kurdistanê pêk hatin.
Li Tirkiyê qeyranên siyasî, aborî, civakî roj bi roj kûrtir bû.Civak bi birçîbûnê re rûbirû ma.
Berî ku ew 72 balafir ji balafirxaneyan bilind bibin, Amerîka û PDK'ê jî daxilî wê planê bûbûn.
Li dijî Kurdan û Tevgera Azadiya Kurdistanê, 'konseya şer' ava kiribûn. Amerîka û PDK'ê jî di vê konsêyê de cîh girtibûn. Li asûmanan îstîxbarata Amerîka, li jêr hevkariya PDK'ê êriş dikirin. Ji wê demê ve ev êriş bê navber û sekin dewam dikin.
Ji meha pûşberê ve, ev şer derbasî qonaxeke nû bû. Piştî hevdîtinên li Bexdayê di nav planê de planek nû xistin dewrê. Herêma Başûr a ku bi salan e di her qadî de hatî dagirkirin, evcar dagirkirin û îlankirina hin herêmên tampon dewam dike. Li herêma Behdînan tiştên ku diqewimin berdewamiya dagirkeriyên herêmên li Rojava ne. Ji civakê û ji cîhanê bi awayekî hostayî tê veşartin ku her wek dewleta Tirk mafdar e li herêmê di nav tevgerê de ye.
Ji çi cesaret girt? Dema ku Serê Kaniyê û Efrîn dagir kir, got; li van deveran ber bi sînorê me xeterî heye. Herkesî pê bawerî anî. Îroj li Başur gerîlayê Kurdistanê wek talûkeyekê nîşan dide. Ji bilî Amerîka û PDK'ê tu kesî bawerî pê neanî. Lê ev herdû hêz, ji bo xeyalên wan qîm dikirin. Bila tu kes nebêje Tirkiye di şerê Sûrî de têk çû. Naa. Di vî şerî de gelek deskeftiyên xwe çêbûn. Îroj li herêma Behdînan navber dabû ji bo xeyalên xwe yên 'mîsaqî mîllî' ji meha Hezîranê ve ji nû de bi rê ketin. Navîgasyona rêwîtîya wan li ser Duhok, Hewlêr, Kerkûk û Mûsilê re derbas dibe. Berî ew bigihêjin van herêman ji bo wan amadekarî jî hatine kirin. Turkmen û PDK'ê, paqijiya derdorê kirine. Xalî û xaliçeyên sor raxistine û li benda artêşa Cengiz Xan in. Di 18'ê Tîrmehê de, parlamenterê Eniya Turkmenên Iraqê Erşat Salihî di axaftinek xwe ya televizyonê de digot; Me û PDK'ê li ser hilbijartinên walîtiya Kerkûk û serokê meclisa bajêr li hev kiriye. Ev yek ji aliyê Devlet Bahçelî ve jî hatibû îtirafkirin. Digot; em ê Kerkûk û Mûsilê daxilî sînorê xwe bikin.
Bahçelî û faşîstên Tirkiyê di mijara Turkmenan de erkdar in. Ew her tim di nav danûsandinan de ne. Ew Turkmenan bi rêxistin dikin. Herî dawî hefteyek berê heyetek ji waliyê Kerkûkê û çend encûmenên Turkmen li Enqerê hevdîtinek pêk anîn. Li gor agahiyên tê gotin ku ev heyet ji bo hilbijartinên Walîtiya Kerkûk û amadekariyên dagirkeriya Tirkiyê hevdîtin pêk anîne. Divê çi were kirin? Dive hêzek, enerjiyek, an jî balyozek ku PDK'ê bide seknandin were dîtin. Dijmin dijmin e. Tu nikarî bêjî bi min re dijminatî neke. Lê em dikarin ji PDK'ê re bibêjîn; Heger tu nebî tu gavek dagirkeriyê nayê avêtin.